Nûçe û kurte nûçe

Nadiyê Efrîn bi serket

Careke din tîpa Efrînê ya gokê li hember tîpa Misfat Banyas bi [3 × 2] bi ser dikeve û ew û bi cemawere xwe ve bi kêf û şahiyeke bê hempa, ji lîstgeha Banyasê derdikevin .

Destpêka beramberkirin li aliyê Misfatê diçû . Lê di çend kêlîkên dawî de rewşa lîskê berve tîpa Efrînê zîvirî û piştî gelek êrîşan ji aliyê wan ve , bi ser tîpê Misfatê de , bi şêwekî tevane , ev serkeftî derket .

Lîstekvanên tîpa Efrînê yên ku gok kirine avêjwara Misfatê ev bûn :

Ebdilkerîm bobekî , Ela'I bêdon , Ibrahîm Hesen . Vê beramberkirinê hîşt ku tîpa Efrînê cîgeha yekê di giropa başûr de jî bistîne .

Em jî hêvî dikin we her tim serkeftî bibînin

****

Hunermend Seydo Reşo çû ser dilovaniya xwe

Seydo di sala 1960î de' ji dayîk dibe. Xewndia xwe ya bilnd li zanîngeha Şamê beşê El-finon El-cemêlê di navîna salên 80î de kuta dike. Li bajarên Şam, Heleb û Beyrûtê pêşangehan li dar dixe. Di sala 1990î de, berê xwe dide Romaniya. Li wir jî di pir pêşangehana de beşdar dibe . piştî 8 salan li romaniya, berê xwe dide Balçîka daku, li wir bi cî û war bibe. Lê, qedqrê tiştekî din dabû ber wî. Di 6ê Ber Çile de, li nexwaşxana ALAS – Biroksêl- dilê hunermedê Kurd S. Reşo disekine. Termê wî, di 14-10 an de, digihe Helebê. Bi beşdariya dost, heval, gundî û nûnerên tevgera Kurd li Sûriyê, di goristana gundê **Çema** de tê bin ax kirin.



Bi navê Komîta NEWROZ ê, em serê hemî berketî û malbata wî saxdikin

****

Dadgeha dîkteror S . Husên destpêkir

Yekemîn car e, di Rojhilata navî de ku, berpirsiyar û serokmarên dewletekê têne dadgehkirin. Dadgehkirina hovê herî bi nav û deng, di Rojhilata navîn de, li Bexdadê, bi cezayê kuştina 143 mirovîn Şî,î ji dundê Dicêl –Başûr- Tên dadgehkirin.



Bê guman, ev gunehkariya Sedêm ne ya bi tek û tenê ye. Belê, bi hezaran ji hemî gelên Îraqê, bi destê wî û hevalên wî hatine kuştin û di gurnên tevahî de hatine veşartin. Ew rêjîma diktetor, çekên kîmawî li bajarê HELEBÇE barabndin. Ji encama wê pênc hezar Kurd hatin kuştin û bi qasî wan jî hatin birîndar kirin. Bêtirî 8 hezar ji malbata BERZANIYAN bi destên wan hatin kuştin. Û li vê dawiyê, termê 513 şehûdên Bezaniyan li başûrê Îraqê, di gurnek tevahî de hatin tîtin.

Em bi hêvîne ku, dadgehkirina Sedêm li gorî gunehên wî û destlatiya wî be.